Dr. Qasimlo: Sembola Rastî, Aştî û dijberê Terorîzimê

Kakşar Oremar
Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Wî hertim û li her derê wiha digot**:“ Gelek ku azadiyê bixwaze, divê nirxê wê azadiyê jî bide...“,** wî dizanî zulim û zordarî çiye. Çimkî li welatekî mezin bibû ku hakimên siyasî tenê bi rêya zorê, gotinên xwe derbasî piratîkê dikirin.
20 sal ji kiryareke tirajîk di dîroka siyasî ya Kurda da derbas bûn. Kiryara ku li pey wê hereketa siyasî li rojhelatê Kurditanê weke laşekî bêser lêhat. Birêveberên komara îslamî li Îranê baş dizanîn ka ew di nava Kurd û azadîxwazên Îranî da çiqas bi gotin, perspektîv û karîzma xwe ya giran lîderekî bi bandore. Piştî çendîn civînên dûr û dirêj bi berpirsên îstixbaratê ra, ev gotina Ayetulah Xaminêyî û Refsencanî ya dawiyê bû**:“ Bi her bihayekê dibe, divê Qasimlo bê kuştin…“.**

Roja 13ê Tîrmeha sala 1989an xebera terora serokê giştiyê KDP.Îranê Dr. Ebdulrehman Qasimlo û du hevalên wî li paytexta welatê Avustrya(Wien) ne tenê Kurdistan belkî hemû Îran hejand û azadîxwaz xistin nava şokeke giran. Kesên ku ji cewherê demokrasiyê fam dikirin an jî berhemên Dr. Qasimlo xwendibûn û ew ji nêzve nas dikin, zû têgihştin ku cîhana demokrasîhezan mamostayekî mezin di xîndingeha demokrasiyê da ji dest da. Heta ew berprsên Îranî yên ku li dijî çareserkirina pirsgirêka Kurd jî bûn, encamdayîna karekî wiha, dûr ji exlaq û pirensîpên dîplomasiyê binav kirin. Çimkî Qasimlo di çaxê hevdîtinên ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd li Îranê, hate kuştin. Ew roj di jiyan û têkoşîna siyasiya gelê Kurd da rojeke herî bi êşe. Teror ji aliyê niwênerên komara îslamîya Îranê ve çêbû. Dewleta Avustirya an jî baştire bêjim destgehên îstixbata wan jî bi temamî agehdarê vê meselê bû. Lê wan çavê xwe ji her tiştî miçandin û bêdeng man. Heqîqet û edalet kirin qûrbana berjewendiyên xwe yên siyasî-aborî!. Cinyeta ku heya roja îro jî detayên wê

veşartî mane, lê eşkeraye ku rayedarên her du dewletan(Îran û Avustrya) li hev kiribûn ku bi her qîmetekê, dengê doza Kurdên Îranê bifetisînin. Tevî ku cinayetek wiha hovane di qelbê yek ji welatên demokratîk yên yekîtiya Ewropa da qewimî, lê heya roja îro jî dewleta Avustrya izin nedaye polîs û dadgeha cinayî ku li ser dusiya terora Dr. E. Qasimlo bixebitin. Dusiya hê jî girtiye û esrarên negotî pirin. Encama vê siyaseta rayedarên Avustrya jî bû ew ku terorîstên Îranî neyên ceza kirin û heta gelek şahid jî hene ku rayedarên dewleta Avustrya jî di karê teror û reva terorîstan da dest hebûye.



Di van çend rojên derbasbûyî da li pey encama hilbijartinên serokkomariyê li Îranê, gel li dijî serketina Ehmedînejad nerazîbûna xwe da diyarkirin. Sextekarî di hilbijartina da rastiyeke neveşartiye û êdî gelên Îranê jî ev sivkatî nepejirandin û bi milyonan rabûn ser piyan.. Hinek şahid ku di dadgeha Mykonos da amade bibûn, niha rastiyeke din jî eşkera kirin**:„ Destê Ehmedînejad jî di cinayeta kuştina Dr. Qasimlo da hebûye.”**

Di 20mîn salvegera terora Dr. Qasimlo da alîgirên aştî û edaletê li hemû cîhanê, dest bi „kempîna vekirina dusya terora Dr. E. Qasimlo“ kirine. Encama kempîna wan heya niha bûye sedem ku di adresa jêr da, bi hezaran kes piştigîriya xwe ji karekî wiha bidin diyar kirin:

http://www.petitiononline.com/Ju131989/petition.html

Ew di cihekî daxuyaniya xwe da wiha dibêjin**:” Piştî derbasbûna 20 salan li ser vê bûyerê, em di wê baweriyê dane ku vekirina dusiya vê cinayetê karekî pêwîst û mumkine. Edalet û mirovahî li ser eşkerekirina vê rastiyê hukimê xwe didin û bi hebûna belgeyên ku di çaxê terorê da bi dest ketine û herwiha şahidên nû yên ku pareke wan beşdarbûbna Ehmedînejad di vê cinayetê da didin xuyakirin, bi rêya çavkanî û saziyên qanûnî eşkere bibe. Îcrakirina edaletê di vê derbarê da tenê rêyeke mayîne ku bêedaletiya ku 20 sal beriya niha derheqa mafê gelê Kurdistan û azadîxwazên Îranê da çêbû, bê cî bi cî kirin..., bi vê ra em ji dewleta Avustrya dawa dikin ku îmkan û rêyên pêwîst ji bo vekirin û bi duvdeçûna qanûnî ya vê dusyayê bigehîne encamê û zemîneya bidawî anîn û encama wê ya dadmendane çêbike. Em ji hemû sazî û dostên çareserkirina pirsgirêka Kurda û demokrasiyê li Îranê û bigiştî alîgirên aştî, azadî û edaletê li cîhanê dawa dikin ku di vê xebatê da hevkariya me bikin û bi îmzakirina vê kempînê piştgîriyê bidine dubarevekirina dusiya terora Dr. Qasimlo.”**

Elbete rastiyeke şefafe ku ger cîhana edalet û demokrasîxwaziyê bikarîbe piştî 20 salan karekî wiha derbasî piratîkê bike, di şert û mercên îro da yê xizmeteke mezin ji pêşkeftina demokrasiyê ra bê kirin. Bi taybetî jî li Îranê ku hereketa demokrasîxwaziyê

êdî bi bêtirs daketiye qada xebatê û bawer nakem êdî bisekine. Herwiha karekî wiha yê emniyetê jî li welatên Ewropa zêdetir bike. Îran ji 30 salan û virda bûye hêlîna terorîstperwerên îslamî û radîkal. Ew li her dera dinê ku bixwazin bi rêya îmkanên ku rayedarên Îranê didin wan, dijberên xwe dikujin an jî didin kuştin. Di çend salên derbasbûyî da bi sedan azadîxwaz û dijberên sîstema totalîter li Îranê ji hêla terorîstên komara îslamî ve hatine kuştin. Wan ji hemû welatên Ewropa bigire heya Amerîka her der ji xwe re kirine meydana terorê. Vê meselê heta rewşa asayêşa cîhanê jî xistiye tehlûkê. Bêdengîya welatên Ewropî li hemberî kiryarên terorîstî yên Îranê bû sedem ku îro ew bi çêkirina bombeyên etomî aştiya cîhanê jî bêxin nava xeterê. Ger berî 20 salan wan çavê xwe ji kuştina Dr. Qasimlo nemiçandiban, elbete terorên piştra jî nemumkin bû ku bên encam dayîn.

Kurte jiyana Dr. E. Qasimlo

Ebulrehman Qasimlo ku weke Rehman Qasimlo jî dihate binavkirin, di 22'ê Kanuna sala 1930'an di nava malbatek dewlemend û navdar de li bajarê Urmiyê hat dinê. Xwîndina xwe ya destpêk û navincî li bajarê Urmiyê bi dawî anî û piştre ji bo berdewamkirina xwîndina xwe çû bajarê Tehranê. Qasimlo ji temenê zarokatiyê bi wan hûrbînîyên xwe yên kûr, zû pêhesiya ku gelê wî di rewşeke kambax û dijwar de jiyana xwe didomîne. Herçend Ebdulrehmanê nûgihiştî ji malbatek dewlemend û bavê wî Mihemed Axayê Wisuq yek ji dewlemend û feodalên herî mezin di herêma Urmîyê de bû, lê wî jiyana xwe qet ji derd û xemên jiyana xelkê reş û rût cuda nedidît. Li ser wê helwesta Kurdheziyê wî çalakîyên xwe yên siyasî ji sala 1945'an dema ku hê di temenê 15 saliya xwe de bû bi pêkanîna (Yekîtiya Ciwanên Demokratên Kurdistan - YCD.K)ê di bajarê Urmiyê de dan dest pêkirin. Piştî ku Komara Kurdistan(Mihabad 1946) bi hevkariya hêzên biyanî û xiyaneta Yekitiya Sovyeta(Sovyetistana berê) têkçû, Dr. Qasimlo bi hevkariya gelek hevalên xwe yên din xebata xwe ya siyasî bi rengekî nihînî û berfireh dîsa da destpêkirin. Piştre ew bû endamê fêrmiyê Hizbî Demokratî Kurdistan. Bi vî rengî wî arman û riya xwe ya dûr û dirêj hilbijart.

Ebdulrehman Qasimlo di temenê 18 saliya xwe de ji bo xwîndina bilind çû welatê Fransayê. Piştî demekê ji wir çû Çikuslowakiya û piştî ku li zanistgeha Piragê lîsansa xwe ya di warê siyasî-civakî de stand di sala 1952'an de çaxê desthilatdariya Dr. Mihemed Musediq vegeriya Îranê û di xebata li dijî empiryalîzmê ya ji bo millîkirina petrola gelên Îranê li rex hêzên opozîsyon yên rijîma seltenetiya M. Riza Pehlewî cih girt. Qasimlo herçend bi temenê xwe ciwan bû, lê li wir ji bo siyasetvanên Îranî hat

xuyanî kirin ku E. Qasimlo di kar û xebata siyasî de mirovekî jîr û jêhatîye. Yanî wî bi pirensîb û terzê xebat û nirxandinên xwe yên siyasî-zanistî bala herkesî kişand ser xwe.
Dr. E. Qasimlo Piştî pênc salan xebata li dijî empiryalîzmê careke din vegerî Çekuslovakiya û karî di sala 1962'an de ji zanstgeha Piragê doktoraya xwe ya di para aborî de jî bistîne.
Dr. Qasimlo heya sala 1970'an wek mamosta di zanistgeha Piragê de **„êkonomiya Kapîtalîstî, êkonomiya Sosyalîstî û teoriya pêşkeftina aborî"**yê, karê xwe yê dersbêjiyê domand.
Karekî herî girîng di jiyana Dr. Qasimlo de ew bû ku ji sala 1976'an heya 1978'an di para ziman û bajarvaniya Kurdan de di zanistgeha Surbonn li Parîs, mijûlî dersgotinê bû. Wî bi nivîsandina çend babetên cur bi cur di rojname û kovarên Ewropî de derheqa jiyana civakî, dîrok û rewşa siyasiya Kurdan, di wê demê de karî heya radeyekê dîrok û pirsgirêka gelê Kurd baştir bi raya giştiya Ewropa bide nasandin.
Dr. Qasimlo li Ewropa mîna kesayetiyek siyasî û zana derheqa pirsgirêka milîya gelê Kurdistanê de dihat nasandin û dewletên Ewropî di vê derbarê de dîtin û nirxandinên wî mîna serokaniyekê dihesibandin.
Li 11 marsê sala 1970'an dewleta Beesîya Îraqê neçar ma ku bi Kurdên başûrê Kurdistanê re li ser maseya gotûbêjê rûne. Dewleta navendiya Îraqê bangek ji bo otonomiya başûrê Kurdistanê da xuyakirin. Wê demê para parastina Iran(SAWAK)'ê li hemû Îranê û bi taybetî jî li rojhilatê Kurdistanê bîr û rayên azadîxwaziyê di mejî û singê hemû gelên Îranê de berbest û zindanî kiribûn. Dr. Qasimlo ji bo ku çalakîyên HDK baştir ji berê organîze bike, vegeriya Îraqê û li wir bi hevkariya hevalên xwe karî di demek kêm de kar û barê xwe yê rêxistinî derbasî herêmên rojhilatê Kurdistanê biken.
Piştî ku di sala 1979'an Mihemed Riza şah Pehlewî ji Îranê reviya Dr. Qasimlo vegeriya rojhilatê Kurdistanê û xebata xwe ya siyasî bi rengekî berfireh li hemû Rojhilatê Kurdistanê da destpêkirin. Piştî serhildana hemû gelên Îranê, Kurdistan jî ket destê şoreşgerên Kurd û xelkê welat, xwe azad û serbest hiss kirin.
Berhemê herî navdar û girîngê şehîdê nemir Dr. Qasimlo ku têza doktoraya wî ye, pirtûka wî ya bi navê,, **Kurdistan û Kurd "**e ku bi şêweyek akademîk û zanistî lêkolînên wî di vê pirtûkê de hatine nivîsandin. Ev kitab yek ji çavkaniyên herî i'lmî û baş e ji bo nasandina dîrok, rewşa aborî û xebata siyasîya Kurdan bi gelên cîhanê ku bi awayekî berfirehtir pirsgirêka gelê Kurdistanê nas bikin.
„ Kurdistan û Kurd „ heya niha bi çendîn zimanên zindî yên cîhanê(Inglîzî, E'rebî, Farisî û…) hatiye wergerandin.
Dr. Qasimlo bi hûrbînîyek temam hemû aliyên pirsgirêka Kurd di vî berhemê xwe yê pirbar de şirove kirine. Ew yekemîn pirtûk bû ku bi awayekî lêkolînî li ser pirsgirêka Kurd li Ewropa çap bibû.

Çend têbînî li ser ramanên Dr. Qasimlo

Li Îrana ku wî çavên xwe têda vekiribûn, kişandina tama jiyana bindestiyê, ji wîra giran dihat. Ew ji malbateke mezin û navdara Kurdên Urmiyê bû. Bavê wî(Mihemed Wusoq) bihayekî mezin dida xwîndin û perwerdekirina zarokên xwe. Rehman çavên xwe di etmosfêr û serdema pêkhatina komara Kurdistan(Mehabad 1946) da vekiribûn. Wî ew sal weke bihara herî xweşa jiyana xwe dizanî û ji wê sal û pêda jî rêya xwe ya ji bo doza Kurdîniyê peyda kir. Rêya ku heta bavê wî jî li dij bû, lê xwezîyên Rehmanê

jîr dûr û dirêj bûn. Pêkhatin û têkçûna komara Kurdistan qet ji bîra wî nediçûn, lê dema behsa tirajêdiya têkçûna komarê dikir, xemeke giran reng û rûyê wî digûherand.Tirajêdiya ku xiyaneta Soveytê ji aliyekê û hevkariya Ingilîz û Emerîkiyan careke din otorîteya Pehlewî li Kurdistan û Azerbayicanê vegerand. Wê bûyera tehil nehişt ku Rehman êdî li Îranê bimîne û bo gehitina bi daxwazên mezin ew hate Ewropa û berê li Fransa û piştra jî li komara Çêkuslovakiya dest bi xwîndinê kir. Di nava xwîndevanan da ew weke kesekî herî jîr û zana navekî naskirî bû. Zû hînî zimanê Çêkî û heta diyalêktên wî zimanî jî bû û di nava xwîndevanan da wek berpirs hate hilbijartin, lê tim û tim mîna çîrokbêjekî hosta li her derê behsa Kurdistana xwe ya şirîn dikir. Li wira li pey wan gerîlayan digeriya yên ku ji bo şerê azadiyê kar û têkoşîn li dijî Nazîsimê kiribûn. Her carê ku yek ji wan didît, bi sedan pirs li ser şêweyên şerê azadiyê û rizgariya gelên bindest ji wan dikir. Bi hezaran kîlometoyan ji Kurdistan dûr bû, lê saniyekê jî welatê wî yê bedew û bindest ji bîrê nediçû. Wî li wira cîhana Kurdistanê ya nenaskirî ji xwîndevanan ra dida naskirin. Ew evîndarê hînbûnê bû û evîna wî û pirtûka qet ji hev cuda nedibû. Sala 1968an yek ji wan kesan bû ku piştigîrî da reforman li welatê Çêkuslavakî ku ew bûyer wek „Bihara Pragê“ hatiye naskirin. Ev helwesta wî bû sedem ku bi malbata xwe ra ji wira hatin derxistin. Dr. Qasimlo piştî „bihara Pragê“ hate Fransa û bi lêkolînên xwe yên berfireh bi rastiyên sedsala 20an hesiya û ji bona wê jî ji Kurdistanê ra otonomî dixwest. Piştre ev rastî kire dirûşma partiya xwe jî ku wiha bû**:“ xudmuxtarî(otonomî) bo Kurdistan, demokrasî bo Îran“.**

Xemsariya welatên Ewropa di sizanekirna terorîstên ku Dr. Qasimlo bi bihayek pir erzan ji me Kurda standin, birîneke kûr di dilê me da vekiriye. Çimkî ew têkoşerekî mezin û bênimuneyê demokrasî, azadî û hertim li dijî terorîzimê bû. Di nava Kurd û biyaniyan da jî Qasimlo wek sembola rastî û dilsoziyê dihate naskirin. Heyf ku wî şîreta bavê xwe ji bîr kiribû ku tim jêra wîha digot:“ Kurê min ger Ecem rastî te hatin, an li ber bireve, an wan bikuje an jî ewê te bikujin…!“

Xweziya di roja îro da Dr. Qasimlo sax bûya, ez bawerim hingî wî yê rolekî pir aktîv di çareserkirina pirsgirêka Kurd da bilîsta. Dr. Qasimlo di roja îro da wek pêxemberê aştiyê jî hatiye binav kirin. Ew têkoşerê qada îro ya siyasetê bû û wî rewşke wiha jî pêşbînî kiribû.

Elmaniya 12. 07. 2009